


	Gustav Klimperbein ji Hermann Mensing übersetzt von Mahmut Aydin
	Ew ne mezin e. Ne piçûk e. Ew ne gêj e, û ew qet ne dîn e jî. Lê qelew, ew qelew e! Ew wisa qelew e, hema wekî hirçekî. Navê wî Gustav e: Gustav Klimperbein!
	Gustav li malekê, li bajarekî mezin dijî. Dema Gustav diçe malê, her tiştên li derdora wî mezin in. Mezin û zirav. Mal, tirimpêl, mirov, herwiha kûçik, kûçikên tîn gerandin, û gişt di mijûlahiyên giran de ne. Lê ne Gustav.
	Gustav darên stûr xweşik dibîne, yên mirov dikare wan hembêz bike, tirimpêlên mezin, ên tê de gelek cih hene, kûçikên qelew, ên ew û mirov hevdu bigewixînin û cizdanên bankê yên stûr ên ku mirov bi wan ti carî xizan nabe. Herwiha balafirên mezin, keştiyên mezin, sendwîçên mezin, mezin û mezin, lihêfên mezin. Û herî zêde ji diya xwe ya qelew, ji bavê xwe yê qelew, ji papaxanê xwe yê qelew û ji her sê masiyên xwe yên japonî yên qelew.
	Gustav darên stûr xweşik dibîne, yên mirov dikare wan hembêz bike, tirimpêlên mezin, ên tê de gelek cih hene, kûçikên qelew, ên ew û mirov hevdu bigewixînin û cizdanên bankê yên stûr ên ku mirov bi wan ti carî xizan nabe. Herwiha balafirên mezin, keştiyên mezin, sendwîçên mezin, mezin û mezin, lihêfên mezin. Û herî zêde ji diya xwe ya qelew, ji bavê xwe yê qelew, ji papaxanê xwe yê qelew û ji her sê masiyên xwe yên japonî yên qelew.



De bila be, li vir ti pirsgrîk nebûn: ên zirav henekên xwe bi wî dikirin.
 Dema ew derbasî baxçeyê dibistanê dibe, jê re dibêjin „Gustavê ziklerzok!“
 „Gustav Berazê bi şingînî!“ jî dibêjin.
 Carnan „Gustavê zikşingînî!“
 Carcaran „Gustavê çîplerzok!“
 Lê banglêkirina herî xweşî wan diçe: „Gustavê ziklerzok!“ e.

„Ziklerzok! Berazê bi şingînî! Divê gişt veşartîbin!“



Rakirina tinazan bi wî giran tê.
 Lê ew naxwaze ji kesekî re qala vê yekê bike.
 Qet carekê ji dayê û bavo re jî.
 Ew dixwaze çareseriyekê bibîne, bes bi tena serê xwe.
 Ew difikire û difikire.
 Dengê tê guhê wî, „Guh nedan!“
 „Guh ne – çi?“
 „Dan!“, wî dengî dubare dike.
 „Guh – ne – dan!“
 „Nebihîstin! Guhdarî nekirin!“
 „Zopikê berde, bila biçe jêr! Ewqas!“
 Dibe ku ev ceribandinek di cih de be...
 Gustav hemû piştî nîvroyê li ber deriyê şîn ê pêşîn, li ser pêlikên nêrdîwanê rûdinê, difikire û difikire.

Dema êvar bi ser bajêr de digire, ew di deriyê dawîn re bi dizîka derdikeve korîdorê, hêdîka bi nêrdîwanan ve derdikeve jorê, derbasî odeya xwe dibe û derî bi ser xwe de kilît dike.
 Diya wî bang lê dike, „Gustav!“
 Bersiv tune.
 „Gustav, tu li jor bi çi de ketiyî?“
 „Were, em xwarina êvarê bixwin.“ Mîdeya Gustav wek a şêrekî birçî dike qurînî, lê Gustav bi biryar e, di odeya xwe de berdewam bifikire, heta ew bizanibe, divê ew çi bike. Lê belê pişt re bavê wî tê û jê re dibêje, derî veke.
 Ew dipirse, „Çi ye?“
 Gustav deng dide, „Grrrrrr!“
 „Hêrs?“
 „Grrrrrr!“
 Û ji ber ku wî wiha baş kiriye, hemû çîrokê jî dê bavê xwe re dibêje.
 Bavê wî „Wax, wax, wax“, dibêje û serê dixwirîne. Diya wî dibêje, „Nebixêr!“



Ji nişka ve ji ber derî ewteewteke tirsnak tê.
Gustav dibêje, „Ka ez carekê binêrim, li wir çî dibe!
Piçek jî tirsî wî tunebû.
Ew diçe ber deriyê şîn ê pêşiyê û derî vedike.
Û pişt re wî dibîne!
Yê hişkolek!
Ew ê wekî darteşiyê hişk!
Yê mezin!
Yê wekî dêwan mezin!
Yê dibe sedema tirsan!
Kûçikê ji bo hemû deman ê tirsaktirîn.



Vî kûçikî li wir tund daye.
Gustav zîq lê dinihêre.
Kûçik jî zîq li wî dinihêre.
Gustav dibêje: „Roj baş.“
Kûçik „Hew!“, diwete û bi kêfxweşî xwe dilivîne.
Gustav li mal dibêje „Xeterî tune ye, ew kûçikek e.“ Gustav dibêje, „Were!“



Kûçik xwe di ber Gustav re dike û derbasî hundirê mitbaxê dibe.
Diya Gustav vediciniqe û dibêje „Ha – ha kûçik li vir e!“ Kûçik radibe ser lingên xwe yê dawîn, lepên xwe davêje ser milên wê û rûyê wê bi carekê ve dadilêse.



Çavên kûçik ên bi qasî hêkên zadikê mezin hene. Û devekî wî yê wekî semasiyekî bi qasî du metreyan mezin.
Guhên wî wisa mezin in, wekî firaxşoyan.
Pirça çermê wî gij bûye, û boçika wî wisa zirav e, wekî boçika mişkan.



Ew diwete, „Hew!“ û di cihê xwe de tund dide û bi kêfxweşî li hemûyan dinêre.
Bavê Gustav bi baldarî destê xwe dirêjî wî dike, serê wî mist dide.
Kûçik ji ber şabûnê dest bi ricifandinê dike.
Diya Gustav bi çavên zîq lê dinihêre.
Gustav li ser heft ewran digere.
Wê ti carê nehêle, ku ev kûçik biçe!
Diya Gustav dibêje „Ew wiha zirav e, teqez ew birçî ye.“ Kûçik dibêje, „Hew!“



Gustav xwarina xwe ya êvarê dide wî.
Sênîkek şpagetî bi goştê hûrkirî.
Kûçik bi carekê ve sênîkê vala dike.

Kûçik derbasî cem Gustav bû û bi çavên qirase
lê nihêrî.



Helbet, ku kûçik li odeya Gustav radizê.
Helbet, ku Gustav êvaran ji wî re qala xwe
dike. Helbet, ku Gustav navekî li wî dike.
Ew navê Ziravok li wî dike!
Kûçik vê baş dibîne.
Dema Gustav wek „Ziravok“ deng lê dike, ew
boçika xwe li ba dike.
Dema Gustav jê re „Ziravok rê veke!“ dibêje,
ew tund dide.

Dema Gustav jê re, „Ziravok xweşik rûnê!“
dibêje, ew xweşik tund dide.



Dema Gustav sibehan xwe ji bo dibistanê
amade dike, Ziravok dixwaze teqez bi wî re
biçe.

Gustav dibêje, „Ev nabe!“

Ziravok digirice.

Gustav dibêje, „Bi rastî!“

Ziravok qîlên xwe yên xeternak ên gezê nîşan
dide.

Gustav dibêje, „Divê tu li vir bimînî, çawa be,
ez ê dîsa bêm.“

Pirça paştstûyê Ziravok gij dibe.

Ji destê Gustav tiştê din nayê: Tîne Ziravok bi
lingê xewgeha xwe ve girêdide.

Dema Gustav diçe, Ziravok dizûre.



Li dibistanê her tişt wekî her carê ye.

„Ziklerzok!“

„Berazê bi şingînî!“

„Divê gişt bi veşartok!“

Zarok bi hev re bang dikin.

Çawa ku Gustav ji xwe re çî plan kiribû,
diceribîne: Ew qet guhdarî nake.

Wisa dike, mîna ku qet pêwendiya wî pê re
tunebe.

Ev ne hêsa ye.

Lê di bêhnvedana mezin de guhdarî nekirin
zêdetir bi kêr tê.



Dema Hans Lange dibêje ziklerzok, siyek wekî gewrahiya berbanga sibehê di ser baxçeyê dibistanê re derbas dibe û tê li pêşiya Hans radiweste.

Sî digirice.

Hans Lange spîçolkî dibe.

Rûyê Hans dirêj û dirêj dibe.

Ev sî dirênên xwe yên xeternak nîşan dide.

Hans Lange di cihê xwe de mat ma.

Gustav sî nas kir.

Bang dike, „Ziravok, tund bide!“

Hans Lange tund dide.

Gustav bang lê dike, „Na, ne tu!“



Hans Lange li baxçeyê dibistanê çok dide.

Ziravok li kêleka wî tund dide.

Gustav tê.

Jê re dibêje, „Ziravok! Tu ji ku hatî vir?“ .

Ziravok ji kêfan diricife û pozê xwe yê hênîk di pozê Gustav dide.

Hans Lange bi baldarî ji cihê xwe radibe.

Ew dipirse, „Gustav ev yê te ye?“

Gustav difikire ‘Gelo min rast bihîst?’

‘Wî got Gustav?’



Hans dubare kir, „Ev kûçikê te ye?“

Gustav dibêje „Na!“, „erêêê! Ez – ez – eh – ez hîn nizamim!“

„Erê, niha çi dibe berazê bi şingînî?“

Dema Ziravok careke din diranên xwe nîşanî wî dan, Hans hîn axaftina xwe neqedandibû.

Û ne tenê ev.

Ziravok devê xwe diavêje delinga şalê Hans û bizeft dikişkişîne.

Wisa bizeft, ku Hans serqûnkî dikeve.



Hans bi dengêkî bi lavahî dibêje, „Kûçikê baş, kûçikê zîrek!“ Gustav dibêje „Ziravok wî berde, were!“ Bêhnvedan qediya.

Ziravok li ber deriyê dibistanê li ser boçika xwe tund da û sekinî.

Gustav ev ji wî re got. Li pola Gustav hemû mijar di derbarê Ziravok de ne. Dixwazin bizanibin! ew ji ku hatiye.

Navê wî çi ye. Ew çend salî ye.


Û gelo ew mirovan dixwe û her wekî din...

Gustav dibêje „Erê“, „Ew dikare mirovan bixwe.“

„Mirovswirek berazê bi şingînî heye!“



Dema ew ji dûr ve bi hovîti dîke ewteewt, mirov di cihê xwe de dîtewize.
Gustav dibêje „Ewk!“, „Ziravok li dij e, ku hûn min wekî berazê bi şingînî bi nav bikin.“
Gişt bi hev re dibêjin „Bes ev tenê henek e!“
Gustav dibêje, „Henekek xweş!“, „Ez nikarim pê bikenim.“



Dibistan qediya.
Ziravok silavê dide Gustav.
Boçika zirav a wekî ya mişkan zirav çep û rast li ba dibe.
Çavên mezin ji ber kêfxweşiyê dibiriqin.
Gustav dibêje „Were! Em diçin malê.“
Zarok ji paş ve li wan dinhêrin.
Wan jî pir dixwestin, ku kûçikekî wan ê wiha hebûya.



Dawî